Rapora YASA ya mehane
Navenda Kurdî ji bo Lêkolîn û Rawêjkariya Yasayî

Adar 2010

YA§A e.V.

Kurdish Centre for Legal Studies and Consultancy

Kurdisches Zentrum für juristische Studien und Beratungen

Navenda kurdî ji bo lêkolîn û rawêjkarîya yasayî

المركز الكردي للدراسات والاستشارات القانونية

YASA e.V.
Postfach 7624
53076 Bonn
www.yasa-online.org

Ebdil Hefîz Ebdil Rehman

Naverok:

Du parêzvanên mafên mirov li Helebê hatin binçavkirin
Dadgeha Rikber xwesteka azadiya endamên serkirdayetiya Partiya Azadî ne pejirand
Rewşa girtiyên siyasî di zindanên Sûriyê de ji rewşa girtiyên tewankariyê wêrantir e
Gelekî girtiyên Kurd ji ber bûyerên Reqayê bo Dadgeha Leşkerî hatin guhastin
Dadwerê tek ê leşkerî du welatiyên Kurd serbest berdan
Endamê Nivîsgeha Siyasî ya Partiya Çep a Kurd li Sûriyê Mehmûd Sefo hate girtin
Ji bo bîranîna komkujiya Helepçe hinek xwendekar li Helebê hatin girtin

Du parêzvanên mafên mirov li Helebê hatin binçavkirin
Di roja 02.03.2010an de vedorgerîneke ewlekarî êrîşî mala çalakvan û mafnasê Kurd Ebdil Hefîz Ebdil Rehman (Endamê Encûmena Rêxistina Mafên Mirov li Sûriyê-MAF) kir û ew binçav kir. Herwiha dest avête ser Computer û Bêrîkfona wî ya tayebet û hinek tişt û CDyên wî yên din. Di wê êvarê de endama Encûmena MAF Nadira Ebdo jî, ku serdana Ebdil Hefîz dikir, bi wî re hate girtin.

Dadgeha Rikber xwesteka azadiya endamên serkirdayetiya Partiya Azadî ne pejirand
Di roja 11.03.2010an de Dadgeha Rikber a Sûriyê xwesteka komîteya parastinê, ya ku doza azadiya endamên serkirdayetiya Partiya Azadî ya Kurd li Sûriyê dike, ne pejirand. Tê zanîn, ku birêz Mistefa Cuma Bekir, Mihemed Seîd Hisên El Umer û Seedûn Mehmûd Şêxo di 15.11.2009an de ji aliyê Dadgeha Tewankartiya li Şamê û yê dadwer ve bi sê sal zindan hatin sezakirin. Ew bi qelskirina hestên neteweyî û arandina kînên zavî (mezhebî) hatin tewanbarkirin.

Tê zanîn, ku Mistefa Cuma endamê Komîteya Siyasî ya Partiya Azadî ye û di 01.10.2009an de ji aliyê Şaxê Felestînê li Şamê hati bû binçavkirin. Herwiha Seedûn Mehmûd Sêxo jî endamê Komîteya Serkirdayetiyê ye û ji aliyê Ewlekariya Leşkerî ve li bajarê Serê Kaniyê di 26.10.2008an de hati bû binçavkirin û herwiha hevalên wî Mihemed Seîd Hisên El Umer jî aliyê vedorgerîneke girêdayî Ewlekariya Leşkerî ve li bajarê Rimêlan di 27.10.2008an de hati bû binçavkirin.

Rewşa girtiyên siyasî di zindanên Sûriyê de ji rewşa girtiyên tewankariyê wêrantir e
Hinek rêxistinên mafnas li Sûriyê, yên ku berevaniya mafên mirov dikin, daxuyaniyeke hevbeş belav kirin. Di wê daxuyaniyê de hatiye ragihandin, ku gelek girtiyên boçûnê di zindana Şamê ya navendî de (Zindana Edra) rewşa wan gelekî wêran e. Kargêriya zindanê siyaseteke sezayî û cudawazî, ku dijî sazûman û yasayên zindanên Sûriyê ye, pêk tîne. Hate ragihandin, ku rewşa girtiya bi gelemperî û rewşa girtiyên siyasî bi tayebet gelekî pîs e û rewşa giştî li dijî rêzikên dan û standina bi girtiyan re ye, yên ku li Cinêfê di sala 1955an de ji aliyê kongirê Neteweyên Yekgirtî ve derbarê qedexekirina tewankariyê, hati bûn ragihandin. Heya aniha girtiyên siyasî û yên boçûnê di zindana Şamê ya navendî de bi tevlêbûna bi girtiyên tewankariyê re pêrgî nakokiyan tên. Girtiyên tewankariya gelek pirsgirêkan ji wan re diafirînin û wan bi gelek awayan diêşînin, herwiha wan bi gelek tiştan jî tewanbar dikin. Ev bûyerên wisa jî bi agahdariya kargêriya zindanê têne kirin.

Ji bo serdana girtiyên siyasî jî alozî gelek hene. Serdana girtiya di bin çavdêriya efserekî tê kontrolkirin û temamiya hevdîtinê ji aliyê wî ve tê tomarkirin. Helbek ev tişt gelek aloziyan ji bo girtî û malbatên wan re derdixe.
Ji aliyekî din ve kargêriya zindanê xwendina pirtûkan ji pirtûkxaneya zindanê li girtiyên siyasî qedexe kiriye û nahêle, ku ew beşdarî korsên fêrkirinê di zindanê bibin, tevî ku ev tişt ji girtiyên tewankariyê re heye.

Gelekî girtiyên Kurd ji ber bûyerên Reqayê bo Dadgeha Leşkerî hatin guhastin
Di roja 23.03.2010an de komek ji girtiyên Kurd ji ber bûyerên Newroza 2010an li bajarê Reqayê ji bo dadwerê leşkerî li Reqayê hatin guhastin. Çar kes ji wan, ku negihîştî ne (Kêmî 18 salan in), ji bo dadgeha kesên negihîştî bi tewana arandina kînên zam û zavî, lêdana karmendekî komarê û arandinda nakokî û tevliheviyan, hatin gumanbarkirin. Ew jî ev in:
Şêrîn Osman Mihemed (Piştî vepirsînê serbest hate berdan).
Ednan Silêman Bozan.
Xelîk Mihemed El Elî.
Mihemed Ebdo Esmer.

Herwiha nozdeh kesên din ji bo dadwerê tek ê leşkerî li bajarê Reqayê hatin guhastin, lê paşê ew serbest hatin berdan, da ku ew dîsa bêne dadgehkirin. Ew jî ev in:
Edhem Mihemed Osib, Ferhad Ebdil Qadir Emîn, Mihemed Elî Hisên, Ehmed Osman Mihemed, Serbest Imam, Şahîn Mistefa Bozan, Casim Mihemed Xelîl, Qeys Mihemed Xelîl, Mihemed Ebdo Osman, Fatma Mihemed Osman, Mamed Mehmûd Hoşo, Hisên Elî Ismaîl, Xebat Ebdil Rehman Hisên, Ibrahîm El Mela, Fewaz Ismet Mistefa û Mihemed Ibrahîm Bozan. Herwiha ev kes jî hatin girtin: Xelîl Şêxo Şêxo, Merwan Mehmûd Hoşo û Necim Mihemed Ebdo.

Dadwerê tek ê leşkerî du welatiyên Kurd serbest berdan
Di roja 17.03.2010an de dadwerê tek ê leşkerî li bajarê Qamişlo civatek tayebet li dar xist. Di wê civatê de welatiyê Kurd Behcet Mihemed Begê (Bavê Şino) serbest hate berdan. Bavê Şino bi endamtiya komeleyeke siyasî û qedexe hati bû tewanbarkirin û di 20.10.2009an de ji aliyê vedorgerîneke girêdayê Ewlekariya Siyasî ve hati bû binçavkirin. Ew bi riya lêborîna giştî, ya ku bi riya yasafermana 22an di 23.02.2010an de derketi bû, serbest hate berdan.

Herwiha welatiya Kurd Rojîn Remo jî bi riya heman lêborînê serbest hate berdan. Ew di

29.07.2009an de ji aliyê vedorgerîneke girêdayî Ewlekariya Siyasî ya bajarê Minbicê (Parêzgeha Helebê) li Kobanî hati bû binçavkirin.

Endamê Nivîsgeha Siyasî ya Partiya Çep a Kurd li Sûriyê Mehmûd Sefo hate girtin
Di roja Yekşemê 28.03.2010an de revdeya Ewlekariya Siyasî ya bajarê Dêrikê (Parêzgeha Hesiçayê) endamê Nivîsgeha Siyasî ya Partiya Çep a Kurd li Sûriyê birêz Mehmûd Sefo binçav kir û paşê ew guhast Şaxê Ewlekariya Siyasî li bajarê Hesiçayê. Heya niha çarenivîsa wî ne diyar e.

Ji bo bîranîna komkujiya Helepçe hinek xwendekar li Helebê hatin girtin
Di roja 16.03.2010an de sê xwendekarên Kurd, ji ber bîranîna komkujiya Helepçeyê, hatin binçavkirin û heya aniha çarenivîsa wan ne diyar e. Ew jî ev in:

Hisên Mihemd Etê, ku li Kobanî di sala 1985an de ji dayik bûye û beşê wêjeya Ferensî li Helebê dixîne û birayê wî, yê ku hati bû serdana wî Ebdil Ezîz, ku sala dawî ji dibistanê (Bekeloriya) dixwîne. Herwiha xwendekarê Kurd bi navê Hisên, ku li Kobanî di sala 1990an de ji dayil bûye û beşê perwerdehiyê li zanîngeha Helebê dixwîne.